# DAWÎ

**Rojan Serdar /Amed**

(Ji dûrve dengê bayê kur tê)

**Zarok_** Goristana çivîkan

**Pîr_** Kûto goristana çivîkan dibe qey.

**Zarok_** Wele li vir eva hatîyê nivisandin pîrê ka em herin.

**Pîr_** Goristan ha weleh emê bibezin dojeha çivîka xwe.

(Dengê pelên daran tê û herdû hêdî hêdî dimeşin di nav goristanê de. Dengê qîrcîna pelan tê)

**Zarok_** pîrê vaye mêzeke li kevirê gorê de hatîyê nivisandin kû Bazê Hirç Sîmir çûye dilovanîya heq

**Pîr_** Çûye kû derê?

**Zarok_** Çûye heq yadê çûye cem xwedê.

**Pîr_** Mirov neçûye, Bazê Hirç Sîmir çûye cem xwedê?

(Li goristanê dengê radyoyek tê, di radyoyê de melayek Quran dixwîne, mela Sûreya Enfal dixwîne)

**Zarok_** Ew çîye yadê ketin kû derê?

**Pîr_** Xwedîyê bayê bang dike dibêje bimre mirin, bila bijî pêşava.

**Zarok_** kî ye pêşava?

**Pîr_** Xwedîye çîvikan û xwedîyê keraset.Ew daye ji me re jîyan. Wî ew bo me mirin dayê.

**Zarok_** Yadê ew zana ye?

**Pîr_** Erê kurê min ew her tiştê dizanê. Heta kû wî li gûyê cîvikê do tov jî dîye, tirîyê. Ewê demeke kin de aj bide me pêşava mizgîn daye.

**Zarok_** Gûyê min tê yadê

**Pîr_** Em ji goristanê derkevin.

**Zarok_** Yadê ez li vir bikim çi dibe?

**Pîr_** Nabe kurê min em herin ber kelaha bajêr.

(Dengê dahol tê. Dû de jî dengê trên û dengbejekî tê hoy hoy werin em biçin bihûştê hoy hoy werin em herin dibiztanê bibînin keneke zindî û bejin werin seyranê werin seyranê)

**Zarok_** Ox çikas xweşe (Dengê mîzê tê)

**Pîr_** kurê min tû li kû mayî?

**Zarok_** Hatim yadê hatim.

**Pîr_** Kûto karê me heye emê biçin mizgeft

**Zarok_** Bo çi emê herin?

**Pîr_** Bo dengê sûra qedîm

**Zarok_** Ma qey qiyamet qetîyaye em nerin cem sûra îsrai?

**Pîr_** Welle ez nizanim. Civat dibêje, emê jî herin mêzekin

(Dengên keşmekeş, çek, lêdan sîren û Qîrîn tê)

**Zarok_** Yadê ez ditirsim.

**Pîr_** Netirse Kuto ew tiştekî qedîm û pîroze.

(li civatê de kalekî 50î salekî bang dike: werin ha werin/destên we da mizgînî/ destê we de binketî/ bila bijî pêşawa)

(Zarok û Pîr hêdî hêdî dimeşîn, dengê solên wan tê)

**Pîr_** Kûto dengê sûrê tê te ciqas xweşe xwezî em dereng neketana.

**Zarok_** Xweşe çî ye yadê Tirs kete min, ew liystokeke ne xweşe.

**Pîr_** Netirse bêje xwedê pêşewa li ser serê me de kem neke.

**Zarok_** Yadê em herin cem leystoka.

**Pîr_** Ha leystok ha leystok.

(Dengê balafir ji dûr ve tê û hêdî hêdî dengê we bilind dibe)

**Pîr_** Kûto were were ew ne xêre.

(Dengê solê wan tê)

**Zarok_** Yadê em herin_ herin.

**Pîr_** Emê mizgînî bistînin herin

**Zarok_** Na ne êdî em herin

**Pîr_** Mizgîna pêşawa em bibihîsin. Wê mizgînî me xelaske, rastîyên wî ewê me rastke.

(Dengê bafirian dibe. Ji civatê dengê hawar û qîrîn tê)

**Payîz 2004_ Amed**